Migrationsverket
Daîra penaberan

Lê rûniştina di bin berpirsîyarîya daîra penaberande

Agahdarî li derheqê xanîyêde

Daîra penaberan gava ku muracaeta te ya penaberî dimêzîne û heta di doza te da biryar dide heman demî ji bona te îmkanên cihê ku tu mûeqet lê bimînê hazir dik e. Eger îmkanên te yê kîradayînê tûnebin daîra penaberan kîray te dide.

Kesê bi serê xwe (yek kes) divê bi kesên dinve odeyek parva bikin. Yên aîle dikarin bi serê xwe li odeyek bimînin, lê dibeku xanî (malê) bi kesên dinve parva bikin.

Daîra penaberan îcaze nade ku kesên din bê xebera wan di xanîyê teda bimînin.
Mimkune ku divê cihê te di nav heman mintikêda were gûhertin anjî te bişînin derekî din ku li wêderê ji bo penaberan xanîyên daîra penaberan hene.

Daîra penaberan xanîyê ku tu têde bimînê bi mobîlya û tiştên din yên ku ji bo malekî zarûrîne xemilandîye. Hemû eşya aîdê daîra penaberan e.

Tu nikarî kîler anjî şûnên din yên ku li derveyê xanîne bikarbînê.

Tu ji lênihêrîna xanî, firak û hawîrdorê berpirsîyarî.

Eger tu baş li xanî nenêrê û zerar û zîyan bidê xanî, eşyayên ku di xanîdene, cîhazên teknîkî û yên din wê hingê divê tu heqê vê yekê bixwe bid e.

Xebatkarên daîra penaberan û yên şerîketa ku ji xanî berpirsîyare bi nîzamî têne kontrolkirina bîna û xanîyê. Berê ku tu têkevê xanîyê daîra penaberan û şîrketa xanî tên xanî, mobîlya û eşyayên din ku di nav xanîdene kontrol dikin ka di çi rewşêdene.

Boendeinformation, kurmanji

Mot65 070116

Rê û rêbazên lê rûniştina xanî

Lênêrîna malê bi rîya:

- Bi berdewamî malê, ocax, firin, sarincok, sarincoka qeşayê û banyoyê pakij bikin.
- Binîya xanî (raxer) bi paçekî şilkirî pakijkin.
- Pêştê ku we banyo kir dêrîyê odeya banyoyê vekirî bihêlin dako nêm (rutubet) derkeve.
- Car carna şibakek bi demek kurt vekin dako xanî hewa bigre.
- Divê ventîlên hewayê neyên astengkirin.
- Li ser dîwar, dêrî, raxer, tapêt û eşyayên din yên malê nivîs nenivînin, xêz nekin û tiştekî pêve nezeliqînin.

Girînge dema ku tu xeletîyek kifşdikî ku dikare xeterî û zerar bide xanî divê tu yekser daîra penaberan û şîrketa ku ji rêvebirina xanî berpirsîyare ji vê yekê agahdar bik ê.

Jibîrneke ku pêveqerişandina pirîzên ceyranê, têlefon û televîzyonê xeter û qedexeye.
Eger tu bixwazê antêna parabolê deynê divê tu serîda ji xwedê xanîyê musade bistînê.

Yek dikare tenê li derveyê malê cixare bikşîn e.

Hawîrdorê biparêze:

- Av, ceyran, û germahî kêm bikarbîn e.
- Dema ku li derve sare şibakan zêde vekirî nehêlin (ev yek zêdetir elektirîk û germahî dixwe).
- Qirşûqal (gilûgemar) ji nav hev veqetîne . Divê gilûgemar û tiştên avitinê li gora rêberkirina xwedê xanî û daîra penaberan were berhevkirin û li cihên taybetî ku ji bo vê yekê hatine çêkirin werin bi cîhkirin.

Cihên vekirî ku hevbeş tên bikaranîn

Nerdîwanên bînayê, hawîrdora derve û xanîyê cilşûştinê cihên hevbeşin (gelemperî) ji bo kesên ku li bînayê dijîn.
Ji bo dilxweşbûn û lê xweşhatina herkesî cixare kişandin di nav malê, li ser nerdîwanan û li hundirê xanîyê cilşûştinê de qedexeye.
Cixare tenê li derve dikare were kişandin. Boçikên cixaran bavêjin nav xwelîdanên ku hatina danîn.
Nabe ku yek nerdîwanên bînayê wek depo bikarbîne û eşya deyne.
Guh bide ew rê û rêbazên ku ji bo bikaranîna cihê cilşûştinê hatine danîn.

Kilîdê xanî biparêze û wenda neke

Dema ku tu ji xanî bardikî divê tu kilîdê xanî şûnva teslîmê daîra penaberan bikê. Eger te kilîdê xanî wendakir divê tu dewsa yê kevnda yekê nûh bidê çêkirin û ev yekjî bi bihaya 200 kronîye.

Meqbûz (vîtik) û îmza

Min ..... tene kilît standine, hejmara xanî .....

Min li derheqê rê û rêbazên lê jîyankirina xanîde agahdarî standîye û ji bo taqîpkirina ewana soz didim.

Nav: .....
Navnîşan: .....
Jimara dosyayê: .....

Cîh (dever): .....
Dem (tarîx): .....

.....
îmza